

## Agahiyên pêşîlêgirtinê ji bo kesayetiyên giştî



Kesên ku ji ber çalakiyên siyasî an jî yên civakî li ber çavê gel in, dikarin bibin armanca dijminatî an kiryarên sûcê.

Di vir de bi taybetî kiryarên sûcdarî yên jêrîn derdikevin holê:

- Gef û heqaretên ku bi E-Mail, telefon an nameyên nenas têne şandin an jî li ser înternetê têne weşandin.
- Sûcên li dijî milkê wek zirara malî li apartmanek, xanî an wesayitekê.
- Sûcên li dijî selametiya şexsî wek gef, heqaret, taciz û sûcên birindarkirina şexsî.

### Ji kerema xwe bala xwe bidin agahdariya jêrîn:

#### Lîsteyan, berhevkirina agahdarî û derbrîn „Outing“ên dijberên siyasî yên ramanê li ser Înternetê

Di warê sûcên siyasî de berhevkirina agahiyan derbarê dijberên siyasî de ne xerîb e. Her wiha tiştê ku bi „Outing“ tê bi navkirin, ev tê wê wateyê ku weşandina daneyên bi vî rengî di warê sûcên siyasî de pratîkek berfireh e. Armanca van kesên ku wusa tevdigerin, belavkirina nezalaliyê ye. Her ku diçe kesayetên giştî, rayedar, însiyatîfa welatiyan û saziyên çapemeniyê, her wiha kesên taybet jî dibin mijara vê pêvajoyê.

Heya niha, rayedarên ewlekarî nizanin ka gelo tenê berhevkirin û tomarkirina navan jixwe dibe sedema metirsiyek berbiçav ji bo kesê têkildar an jî na. Tenê di rewşên ku tespîten zêdekirina xetereyê têne dîtin, piştî nirxandina rewşê bi awayekî konkrêt tedbîrên polîsî yên şexsî (mînak, agahdarkirina kesê têkilîdar heya destpêkirina tedbîrên parastinê) têne destpêkirin da ku pêşî li xetereyan were girtin. Bi tenê diyarkirina navên kes, sazî an rêxistinan di berhevokên agahdarî de ku hatine destnîşankirin, bi gelemperî hewcedariyê ferz nake ku kesên têkilîdar bi awayekî çalak werin agahdarkirin. Agahdariyê-ke gelemperî dê niyeta sûcdaran pêşve bibe.

Jêder: BKA

### Wek kesayetiyek giştî di qada taybet de:

- Di derbarê xetereyan de haydariyek taybetî bi pêş bixin, her dem bi baldarî li derdora xwe temaşe bikin û heger we tişteke gumanbar dît, derhal bi jimareya acil 110 polîs agahdar bikin.
- Ji hawîrdora xwe ya şexsî, ango malbat, hevkar, cîran an jî çavdêrên zarokên xwe bixwazin ku her dem baldar bin.

- Di weşandina daneyên şexsî - bi taybetî di torên civakî de - hişyar bin û endamên malbata xwe jî haydar bikin.
- Bi qasî ku mûmkîn be, hem li malê hem jî li ser kar otomobîla xwe li garajekê park bikin.

**Heger hûn di çarçoveya fonksiyona xwe va giştî de tevdigerin:**

- Berî bûyerên giştî, bi berpirsiyaran re herikîna tam ya programê nîqaş bikin. Di vê de zelal-kirina wê pirsê jî heye ka gelo metirsiyên muhtemel ku ji koma beşdar an serdankeran derdikevin, hene an na.
- Li cihê agahdarî derbarê tedbîrên ewlehiyê de bistînin, mînak, rêyên revê, bicihkirina hêzên ewlehiyê, hwd.
- Xwe ji kesên êrîşkar, dijminîkar dûr bigrin. Hêdî bimînin û ji provokasyonên devkî an jî ne devkî dûr bisekinin.

**Heger hûn peyamên gefxwarinê bistînin:**

- Her tehdîdê cidî bigirin. Tu bersiv nedin daxwazên sûcdarê. Di her rewşê de, derhal polîs agahdar bikin.
- Dîqet bikin ku name û tiştên din yê çapkirî dikarin şopan hilgirin. Belgeyên xwe biparêzin û heger mûmkîn be dest nedin wan. Belge bikin ka name çawa ji we re hatine radestkirin.
- Tehdîdên ku hûn bi E-Mail an rasterast bi rêya Messengerê distînin, ji kesên din re neşînin, lê belê li bendê bin ku polîs peyaman ewle bike.
- Heger mûmkîn be, têlêfônên tehdîdkar tomar bikin û danûstandinê bi hûrgulî belge bikin (cih an girêdan, dengê bangker, dîrok, dem, hwd.).
- Heger hûn li ser Înternetê têne tehdîtkirin an heqaret li we tê kirin, mesajan hilînin, mînak, bi Screenshotê.

**Heger hîsa ewlehiya we ya şexsî bi domdarî bikeve bin bandorê:**

Wezaretê Karên Hundir ya Eyaleta Nordrhein-Westfalen, ji bilî erkên rayedarên polîsên navçeyê, di bin jimareya telefonê 0211 / 871 - 3131 de „Xala têkiliya navendî ya têkiliyê ji bo pirsgerêkên ewlehiya polîs ji bo rêber siyasî“ ava kiriye. Xala pêwendiya naven 24 seatan vekirî ye û bi rêxistinî bi navenda rewşê ya hukûmeta eyaletê ve girêdayî ye.

**Heger bi fîzîkî êrîş li dijî we bê kirin an di pêkanîna fonksiyona xwe ya giştî de werin astengkirin:**

- Dudil nebin, ji jimareya acîl 110 polîs agahdar bikin heger gef li we hat xwarin.
- Bi awayekî aktîf ji temaşevanan, wek kesên derbasbûyî, bixwazin ku alîkariyê bidin. Bi taybet bi van kesan re bi gotinên wek „Hûn bi çakêtê şîn! Pêdiviya min bi alîkariyê heye!“ biaxivin. Bi vî awayî, dibe ku kesê ne beşdar rewşa we ya acîl nas bikin û bi hejmara acîl 110 re telefon bikin da ku ji polîs alîkariyê bixwazin.
- Li deverên giştî yê wekî dikan an veguhastina gelemperî bigerin. Bi jimareya acîl 110 di demek zû de polîs agahdar bikin.
- Di her rewşê de li ba polîs giliyê sûcê qeyd bikin.

**„Çekên berevaniyê“:**

Polîs bikaranîna çekên bi navê berevaniyê krîtîk dibîn, yê wek spreya berevaniyê. Her nezeliyek di tevgerê de, her bi derengketinek di karanîna çeka berevaniyê de dikare encamên kujer ji we re pêk bîne. Dibe ku sûcdar jî bikaribe „çeka berevaniyê“ ji destê we bigire û paşê li dijî we bikar bîne. Bikaranîna spreya berevaniyê yê li dijî mirovan dikare bibe mijara pêvajoya lêpîrsîna sûcê. Bala xwe bidin ku hemî çekên ku di bin qanûna çekan de ne û di bin hin şert û mercan de destûra „hilgirtin“a wan di nav gel de heye, li gorî § 42 ya Zagona Çekan hilgirtina wan di bûyerên giştî de qedexe ye. Koda QR ya jêrîn we digihîne salnameya çekan ya Wezaretê Navxweyî ya Eyaleta Nordrhein-Westfalen.



**Agahî li ser ewlehiya mekanîkî û teknîkî li cihê kar û malê:**

Cihên qels yê li cihê kar û li malê ji sûcdaran re derfetên baş ji bo pêkanîna sûcan pêşkêş dikin. Ji ber vê yekê vekolîna xalên qels gavek girîng e hem ji bo kifşkirina derfetên minasîb ji bo sûcdaran ji bo pêkanîna sûcan û hem ji bo ku tedbîrên lazim ji bo parastina ewlehiya mekanîkî an elektronîkî were standin.

Divê sîgorteyên mekanîkî di plansaziya sîgorteya we de pêşîniya herî pêşîn be. Ew ji bo parastina bi bandor şertên bingehîn in. Pergalên alarmê yê lêzêdekirî yê dizî an êrîşê jî parastina zêdetir pêşkêş dikin, ji ber ku bandora wan ya ragihandinê xetera kifşkirina sûcdarê pir zêde dike.

## **Agahiyên pêşilêgirtinê ji bo kesayetiyên giştî**



Bandora berhemên ewlehiyê yê ku li sûkê têne peydakirin tenê bi plansazkirin û sazkirina projeya profesyonel dikare were garantîkirin. Şirketên ku xwe bi çavdêrîkirina plansazkirin û sazkirina projeya profesyonel ve girê dane, di „Delîla navnişanê ya şirketên sazkirina amûrên ewlehiya mekanîkî“ û her wiha di „Delîla navnişanê ya şirketên sazkirina pergalên alarmê yê êrîş û dizîr“ yê LKA NRW hati-ne bi navkirin.

Navnişanên şirketên berhemên ceribandî/pejirandî li ser înternetê hatiye weşandin di bin: [www.polizei-bayern.de](http://www.polizei-bayern.de) > Kriminalität > Vorbeugung > Beratung > Technische Beratung.

### **Şewirmendiya belaş ya polîsê**

Li ser teknolojiya ewlehiyê ya ku polîs pêşniyar dike, şîreta belaş, bêalî bistînin. Hûn dikarin agahiyên bêtir li ser çawaniya gihiştina navendên şewirmendiya polîsê û delîla navnişanê li ser malpera polîsê ya NRW bibînin: [polizei.nrw](http://polizei.nrw.de) > Kriminalität > Wohnungseinbruch.

Şîretên din yê li ser ka meriv çawa xwe û milkê xwe bi bandor biparêze dikare li vir were dîtin: [www.polizei-beratung.de](http://www.polizei-beratung.de).

### **Ewle di karûbarê NRW de**

Kampanyaya eyaletê li ser malpera [www.sicherimdienst.nrw](http://www.sicherimdienst.nrw) pêşniyarên praktîk yê kar ji bo grûpên armanckirî ji bo karên di sektora giştî de, dixê berdest. Beşek ji van pêşniyarên bi wan komên pîşeyê ve mijûl dibe yê ku ji ber fonksiyona wan ya diyarkirî, navdariya wan ya têkildar û desthilatdariya wan ya biryargirtinê rûbirûyê redkirin û dijminatîyê dibin. Di nav wan de bi taybetî karbidestên hilbi-jartî, siyasetmedarên herêmî, û dadger û her weha rêveberên desthilatdariyê hene.